



Dewletbûn

Metîn

Herêma Kurdistanê piştî ewan rûdanên vê dawîyê, berev qûnaxên nûtirve diçît û pêşhat ta radeyekê diqazanca herêma da pêk dihên û didilxoşkerin, nexasime ko dengêk yê bilind dibît û daxwaza dewletbûnê diket. herçende dibît me ji gelek alîyanive kêmasî hebin û hêj bi dirustî me ew sitirakçera pêkînana dewletê peyda nekirbît, lê dirustkirina evê mijarê di Îraqê da û li rojhelata navîn bi taybetî tiştekekê nûye û bizaveke jibo guhurîna ewê eqlîyeta sentiralîzimî û xwe sepandinê. eve hokareke ko takê Kurd jî êdî hizirê divê



mijarê da biket û givaştinekê li ser hikûmeta herêmê û sazîyên wê biket ko berev sîstematîkîyê û pîlan danîna dirustve biçin û handanek bît ko gavên rast û dirust bo bidestveanîna evê xewna mezin bihêne havêtin.

Serukê herêmê Mes'ud Barzanî bi aşkira yê daxwaza rîfrandumê û dirustbûna dewleta Kurdî diket, herçende ta nuke dîtineka hev girtî bo evan daxwazîyan dinav alîyên sîyasyên Kurdî da peyda nebûye, lê hemû dihevpişkin li ser bi destveînana evê xewnê, lê her êk bi mîkanîzim û şeweyekê rêya gehîştina vê xewnê divewjêrît. helbet dibît ev pirse ta nuke li dev cemawerî jî ya ruhîn nebît, lê dîyare ko diblumasîyeta Kurdistanî şîyaye hindêk gavên erênî bihavêjît bo qaylîkirina hêzên mezin ko danpêdanê bi serxbobûna Kurdistanê biken, yan eger vê jî neken li dij ranewestînin.

Ev gava deshelata Kurdî gaveka pîroze û hezdikeyn diqalibê suzdarî da derbikevît û berev piraktîkeka karave bihête arastekirin. anku fere kar jibo evê çendê bihête kirin û pîlaneka dîyar hebît jibo gehîştina wê. anku êk gutarî û êk helwîstîya hêzên sîyasyên Kurdî, gerentîya serketina evê gavê ye. bla hemû şîyan jibo gehîştina evê xewnê bihêne



mezaxtin û bila şeqamê Kurdistanê jî bihête haydarkirin ka
dê di ayndeda toşî ç givaştin û serbarkan bît. anku rewşa
navxweyî bihête hêminkirin û qeyran bi rêka têgehiştina
cemawerî jibo giringîya evê qûnaxê bihêne derbazkirin.
neku hindek alî bizava girjkirina şeqamê biken û wî bikene
bereyekê dij bo deshelatê. evê xewnê zûr qurbanî pê divên
û ya ji hemîyan giringtir, pêdivî bi êk rêzîyê heye. bila her êk
ji layê xove yê erênî bît û bi şîyanên xwe yê harîkarbît jiboy
ko evê xewnê bikeyne ketwar û êdî çavê me hemîyan li
asoyekê geştir bît û çaverê mizgînîya dewletbûnê bîn.